Lênêrîna we, bi awayê we

Lênêrîna mezinan a sosyalê diguhere, da ku di awayê lênêrîn û pişţevanîya we de bêtir serxwebûn, tercîh û kontrolê bide we.

Xizmetên dema bê dê ji bo lênêrîn û pişţevanîya we bêtir serxwebûn, tercîh û kontrolê bide we. Şaredarî, NHS, û sazîyên herêmî pev re xebatê dikin ku li herkesî bê guhdarîkirin û alîkarî jê re bê dayin. Agahî û şêwirdarîya çêtir ê alîkarîya we bike ku hun xizmetên ku hun dixwazin bi dest bixin.

Heke mafê we yê pişţevanîya domdar hebe, hun ê bikanibin tercîh bikin ku wê bi xwe plan bikin. Hun dikanin hilbijêrin ku peran bistînin, jê re budçeya kesanî tê gotin, da ku bihayê wê bidin. Em armanc dikin ku vê xizmeta nuh ji nîvê 2010an û pey ve pêşkêş bikin.

Ev destpirtûk ê alîkarîya we bike ku hun van guherînan û ku dê çawa bandorê li we bike, fahm bikin.

Sîstem ê çawa bixebitê

1. Hun bi Şaredarîyê re têkilî çêdikin. Em bi we re pêwîstîyên we gotûbêj dikin, da ku bibînin ku mafê we yê pişţevanîya domdar heye an na.
2. Heke mafê we tunebe, em ê we li gel sazîyên herêmî, xizmetên din ên Şaredarîyê yan NHS têkildar bikin, da ku ji bo we pişţevanîya rast a ku ji bo çêtirkirina kalîteya jîyana we ji we re bibe alîkar, bi dest bixin.
3. Heke mafê we hebe, em ê pişţevanîyeke demkurt ji bo we pêşkêş bikin. Wek mînak, dibe ku di nav vê de rehabîlîtasyon an terapî hebe. Piştî vê, em ê pêşketina we pêşçav bikin, da ku bibînin ku pêwîstîyên we guherîne an na. Dibe ku ji we re êdî pişţevanîya domdar ne pêwîst be.
4. Heke ji we re pişţevanîya domdar pêwîst be, em ê bi we re pêwîstîyên we ji nuh de binirxînin.
5. Ev yek ê li ser budçeya we fikirekê bide me, da ku hun bikanibin hilbijêrin ku hun kîjan xizmetan dixwazin. Ew ê her weha ji me re bibêje ku divê hun tu bihayên lênêrînê bidin an na. Xizmetên ku hun hildibijêrin, divê li ser wê bingehê be ku bi dîtina we çi tişt ê jîyana we çêtir bike.
6. Hun dûre plana pişţevanîya xwe saz dikin. Hun dikanin ji me, hevalên xwe û malbata xwe alîkarîyê bistînin ku vê yekê bikin.
7. Hun li ser plana xwe bi me re li hev dikin.
8. Nuha hun dikanin jîyana xwe bidomînin. Em ê pêşketina we bi rêzdarî pêşçav bikin û heke pêwîstî hebe, plan û budçeya we yê bê eyarkirin.

Ev ê çawa bixebite?

Di beşên bê de, li ser evên jêrîn agahî heye:

- Mafê kê yê pişţevanîya domdar heye

- Heke mafê we tunebe, çi dibe
- Budçeya kesanî û lênêrîn û plana piştevanîyê
- Ewle mayin
- Heke hun li kesekî ku jê re piştevanîya domdar divê binêrin, wê çi bibe
- Hun çawa dikanin bêtir agahî bi dest bixin.

Mafê kê yê piştevanîya domdar heye?
Her kesê ku ji 18 salî meztir e û krîterên (pîvan) me yên mafdarîyê bicîh tîne.

Hun dikanin li vê websîteyê li pîvanên mafdarîyê binêrin:
www.hackey.gov.uk/adults-and-older-people.htm.

Heke mafê min tunebe, çi dibe?
Her kesê ku his dike ku jê re lênêrîn û piştevanî pêwîst e, dê li wan bê guhdarîkirin û alîkarî bê dayin. Heke mafê we tunebe, hun ê li gel sazîyên herêmî, xizmetên din ên Şaredarîyê yan NHS bên têkildarkirin, da ku ji bo we piştevanîya rast a ku ji bo çêtirkirina kalîteya jîyana we ji we re bibe alîkar, bi dest bixin.

Nuha em bi NHS, mirovên herêmê û sazîyên herêmî re xebatê dikin. Da ku bi cîh bikin ku hemû xizmetên lênêrînê pev re bi bandor dixebitin û ku agahîya ku alîkarîya we bike ku hun ji bo çêtirkirina jîyana xwe tercîhên rast bikin, peyde dibe.

Dibe ku hun sazîyeke li cîhekî taybetî yan ku pêwîstîyên we yên çandî fahm dike, tercîh bikin. Dibe ku rehabîlîtasyon, terapî yan xizmetên din ên li Hackney peyde dibin bi kêrî çêtirkirina tendurustî û xweşîya we bên. Em dikanin ji bo birêkxistina wan alîkarîya we bikin.

Heke mafê min ê piştevanîya domdar hebe, çi dibe?
Heke mafê we yê piştevanîya domdar hebe, hun ê bikanibin plana xwe ya lênêrîn û piştevanîyê, li ser hîmê ku bi dîtina we çi yê jîyana we çêtir bike, saz bikin. Hun ê bikanibin ji bo dayina bihayê van xizmetan, budçeya xwe ya kesanî saz bikin. Hun dikanin vê yekê bi xwe saz bikin, an jî dibe ku hun tercîh bikin ku hun hinek ji budçeya xwe bidin Şaredarîyê yan sazkarekî serbixwe ku wê ji bo we bike.

Lê belê, heke ev ji bo we nebe, em dikanin hemû piştevanîya we, wek ku em nuha dikin, bi rêya xizmetên Şaredarîyê saz bikin. Hun her weha dikanin pakêteke tevlihev ji xizmetên Şaredarîyê û piştevanîya ku hun bi xwe saz dikin, tercîh bikin.

Budçeya kesanî çi ye?
Pereyê ku hun dikanin ji bo xizmetên ku hun difikirên ku dê kalîteya jîyana we çêtir bike.

Planeke lênêrîn û piştevanîyê çi ye?
Plana we ya lênêrîn û piştevanîyê hemû li ser we, pêwîstîyên we û ku çi piştevanîyê dixwazin ku alîkarîya we ji bo jîyaneke serbixwe bike ye. Tiştên wanî dê di nav de hebin:

- Tiştên ji bo we û arzûyên we girîng
- Ji bo çêtirkirina tendurustî û xweşîya we çi lênêrîn û piştevanî pêwîst e û kî yê wê ji bo we pêşkêş bike
- Lênêrîn û piştevanîya we yê çiqasî bajo
- Şaredarî yê çawa çavdêrîya plana lênêrîn û piştevanîya we li gel bandora wê ya li jîyana we bike û wê pêşçav bike
- Piştevanî yê bi çiqasî bibe mal û hun çawa dikanin budçeya xwe ya kesanî birêve bibin

Divê Şaredarî plana we belê bike.

Heke pêwîstîyên min biguherin an piştevanî baş nemeşe, çi dibe?
Em ê bi rêzdarî li ser planê bi we re bipeyivin, da ku bibînin ku bandoreke erênî li jîyana we dike yan na. Em ji vê re pêşçavkirin dibêjin. Heke tiştên ku hun hêvî dikin ku bi dest bixin biguherin, piştevanîya ku hun bi dest dixin jî dikane biguhere. Di pêşçavkirinê de, heke piştevanî baş nemeşe, hun dikanin wê ji me re bibêjin. Em ê bi we re gotûbêj bikin ku ji bo alîkarîya we divê çi guhertin pêk werin.

Heke pêwîstîya min bi piştevanîya domdar hebe, dê mesrefên lênêrînê hebin?
Bi hatina we ve girêdayî, dibe ku hun mesrefekî bidin. Polîtîkayeke me heye bo bihayên bêtir rewa yên xizmetên lênêrîna civakî. Dê li gora Rêberîya Beşdarîyên Rewa ya Departmenta Tendurustîyê bihayên ji bo we bên nirxandin. Berî ku plana lênêrîn û piştevanîya we bê sazkirin, wê ji we re bê gotin ku muhtemelen hun ê çiqasî bi xwe bidin.

Ez ê bihayên lênêrînê çawa bidim?
Heke hun hilbijêrin ku budçeya xwe ya kesanî wek dayineke dîrekt bistînin, di normalê de biha yê ji dayina we bên kuştin. Heke hun hilbijêrin ku Şaredarî dayina bihayê hinek an hemû xizmetên ji bo we saz bike, dê her meh raporeke bihayên ku divê bên dayin ji we re bê şandin.

Budçeya min a kesanî yê çiqas be?
Miqdara peran ê li gora ku çiqas lênêrîn û piştevanî ji bo we pêwîst e û ku çi bihayan divê hun bi xwe bidin be. Piştî nirxandinê, li ser miqdarê fikreke we yê hebe.

Ez ê mecbûr bimînim ku bi xwe bi budçeyê mijûl bibim?
Na. Hun dikanin ji heval, malbat an profesyonelan alîkarîyê bistînin, da ku bicîh bikin ku hun lênêrîna ji bo we rast distînin.

Ez dikanim budçeya xwe ya kesanî çawa serf bikim?
Hun dikanin pereyê xwe bi gelek awayan serf bikin. Tiştên wek:
- Kar bidin kesekî ku alîkarîya we bike. Dibe ku hevalek an endamekî malbatê be. Lê belê, heke ew kes jî bi we re rûdine, hun nikanin kar bidinê.
- Ji sazî yan rêxistinekê xizmetan bikirin.
- Pêwengên pisporî bikirin.
- Bihayê perwerda kar, çalakîyên dema vala an çalakîyên civakî bidin.

Hinek tişt hene ku hun nikanin peran lê serf bikin, wek:

- Peran bidin kesekî ku we têxe rîskê.
- Peran bidin xizmetên ku ji bo çêtirbûna we yan zêdekirina kalîteya jîyana we nabin alîkar.
- Peran bidin xizmetên ku ne beşeke plana we ya piştevanîyê ne.
- Peran bidin bo mesrefên malbatê yên wek fêkî û sebze û kincan.
- Hemû tişên neqanûnî.

Ez ê êdî ji berê bêtir peran bistînim?
Na. Bêtirî yê ku ji xwe hun distînin, tu pereyê nuh ê ji bo we neyê. Guhertin di awayê serfkirina peran de ye.

Heke ez serf nekim, ez ê peran hilînim?
Na. Divê pere li gora plana lênêrîn û piştevanîya we bê serfkirin. Çi neyê serfkirin, divê şûnve bê dayin.

Heke pere çewt bê serfkirin, çi dibe?
Em ê bikanibin wî pereyî bi şûn ve bistînin.

Şaredarî yê çawa zanibe ku ez peran rast serf dikim?
Plana we ya lênêrîn û piştevanîyê yê dîyar bike ku divê pere çawa bê serfkirin. Em ê pêşveçûna we û ku hun pere çawa serf dikin bi lênêrîna fatore û fîşên we bişopînin.

Ew ê bandorê li alîkarîyên sosyalê yên ku ez nuha distînim bike?
Na. Bandor ê li alîkarîyên sosyalê nebe. Budçeya we ya kesanî ji bo bihayê lênêrîn û piştevanîya ji we re pêwîst e. Ew ne hatineke kesanî ye û ji bo armancên bac (tax) an alîkarîyên sosyalê, divê wek hatin neyê daxuyanîkirin.

Ez bi fikar im ku ev tercîh hemû dikanin rewşa min bêtir hesas bikin. Ez ê çawa ewle bimînim?
Pir girîng e ku ewlebûna we bê bicîhkirin. Wek beşeke plana we ya lênêrîn û piştevanîyê, em ê ji nêzîk de li her tiştê ku dikane we têxe rîskê binêrin, û bi we re awayên kêmkirina rîskan gotûbêj bikin.

Heke hun his dikin ku kesek xerabkarîya we dike, divê hun bi karmendên lênêrîna xwe yan Tîma Ewlehîya Mezinan a Şaredarîyê re bipeyivin. Hemû agahîya parvekirî yê nehênî bê hiştin.

Hun dikanin bi bi telefonê li 020 8356 5782 li gel Tîma Ewlehîya Mezinan têkilî çêbikin, an jî bi email: adultprotection@hackney.gov.uk

Heke berê min Dayina Dîrekt hebe, çi dibe?
Hun ê di sîstema nuh re derbas bibin. Ev ê ji bo piştevanîya ku hun distînin bêtir vezelokbûnê bide we.

Ez li kesekî dinêrim. Ev yek ê çi bandorê li min bike?

Di nav nirxandinê de li ser nêrevanan pirsek heye. Hemû piştevanîya ji nêrevanan, divê di plana piştevanîyê de bê hesibandin, ku di budçeya kesanî de xuya bibe.

Ez dikanim çi hêvî bikim?
Wek nêrevanekî, mafê we yê nirxandinekê heye û hun dikanin tev li nirxandina kesê ku hun lê dinêrin bibin. Nêrîn, fikir û xwestekên we girîng in. Hun dikanin hêvî bikin ku li ser demname, awa û miqdara lênêrîna ku hun pêşkêş dikin, tercîhek we hebe.

Heke kesê ku hun lê dinêrin mafê piştevanîya domdar hebe û tercîh bike ku budçeyeke kesanî hebe, hun dikanin tev li awayê sazkirinê û serfkirina pere bibin.

Ji bo bêtir agahîya li ser xizmetên ku ji nuha de tên pêşkêşkirin, telefon bikin bo Xeta Alîkarîyê ya Nêrevanan li 020 8356 5054 (demên vekirî: Duşem-Înî 8.00-20.00, Şemî 9.00-13.00) an jî email bişînin bo carers@hackney.gov.uk

Hun her weha dikanin yekser tev li guhertinên di lênêrîna civakî ya mezinan de bibin, bi tevlêbûna koma şêwirdarîyê ya Şaredarîyê ya bi navê Hevparên Wekhev ên Lênêrînê (Equal Partners in Care). Ji bo tevlêbûnê telefon bikin bo 020 8356 2721.

Hun dixwazin bêtir agahîyê bi dest bixin?
Ji bo bêtir agahîya li ser ku lênêrîna civakî ya mezinan çawa diguhere, ku agahîya bi zimanê cuda û formatên cuda jî di nav de ye:

Telefon bikin	020 8356 6262
Email bişînin	trasc@hackney.gov.uk
Biçin	www.hackney.gov.uk/trasc
Binivîsin	Your care, your way, Freepost LON18819 Room 82, Hackney Town Hall London E8 1EA